Rapora YASA ya mehane
Navenda Kurdî ji bo Lêkolîn û Rawêjkariya Yasayî

Mijdar 2009

YA§A e.V.

Kurdish Centre for Legal Studies and Consultancy

Kurdisches Zentrum für juristische Studien und Beratungen

Navenda kurdî ji bo lêkolîn û rawêjkarîya yasayî

المركز الكردي للدراسات والاستشارات القانونية

YASA e.V.
Postfach 7624
53076 Bonn
www.yasa-online.org

Pîr Ristem

Naverok:

- **Ji ber çalakiyên wan ên hunerî şeş meh sezaya zindanê li du welatiyên kurd hate birîn**
- **Ji 7 heya 12 salan sezaya zindanê ji bo pênc welatiyên kurd**
- **Ji bo sê siyasetvanên kurd sê sal zindan**
- **Siyasetvanê kurd Mihemed Salih Xelîl hate girtin**
- **Xwendekarê kurd Rojhat Mihemed Mihemed hate girtin**
- **Ewlekariya siyasî li Helebê du xwendekarên kurd digire**
- **Asayîşên elman endamê MAF Enewr Deqorî girtin**
- **Welatiyekî kurd wendayî ye**
- **Xwendekarekî kurd ji bajarê zanîngeh û zanîngeha Şamê hate avêtin**
- **Hinek çavkanî dibêjin ku siyasetvanê kurd Pîr Ristem hatiye girtin**
- **Bêrîvan Farûq Mihemed û Selîm Ezîz hatin girtin**

Ji ber çalakiyên wan ên hunerî şeş meh sezaya zindanê li du welatiyên kurd hate birîn

Rêxistina kurdî ji bo parastina mafên mirovan û azadiyên giştî li sûriyê DAD ragihand, ku dadgerê tek ê leşkerî li bajarê Qamişlo di roja yekşemê 01.11.2009an de biryar bi şeş meh zindan û 100 LS di der heqê du welatiyên kurd de da. Herdû welatiyên kurd Mihemed Seyfedîn El Xido (1986) û Nadir Newaf Xelîl (1981) ji bajarê Dirbêsiyê bi

endamtiya komeleyek nihênî û qedexe û herwiha gurkirin û arandina kînên zavî û tayifî hatin tewanbarkirin.

Tê zanîn ku bargeha ewlekariya ramyarî ya bajarê Dirbêsiyê di 13.10.2008an de herdû welatiyên kurd Mihemed Seyfedîn El Xido û Nadir Newaf Xelîl ji ber çalakiyên wan ên hunerî û gelêrî girti bûn û di roja 13.04.2009an de ew serbest berda bûn.

Ji 7 heya 12 salan sezaya zindanê ji bo pênc welatiyên kurd

Di roja 03.11.2009an de dadgeha ewlekariya komarê ya bilind biryar ji 7 heya 12 salan sezaya zindanê di der heqê pênc welatiyên kurd de da. Welatiyên kurd ên ku hatin sezakirin ev in:

1-Cegerxwîn Mihemed Ekrem Şêxmûs (1989) di 15.01.2007an de hati bû girtin û Sefqan Reşîd Xelo (1990) di 19.02.2006an de hati bû girtin. Herdû jî bi 5 sal zindan hatin sezakirin. Ew bi endamtiya komeleyek siyasî, nihênî û qedexe (PYD), hewldana parçekirina beşekî ji xaka sûriyê û gihandina wî parçeyî bi welatekî biyanî ve hatin tewanbarkirin. Herwiha bi 10 sal zindan jî hatin tewanbarkirin bi behaneya ku ew hin kiryar dikin da ku cengek navxweyî li sûriyê pêk bê. Paşê biryara herî giran (10 sal zindan) li wan hate birîn.

2-Reşîd Xelo Xelo (1958) di 19.02.2006an de hati bû girtin û çar sal û nîv sezaya zindanê li hate birîn. Ew bi endamtiya komeleyek siyasî, nihênî û qedexe (PYD), û hewldana parçekirina beşekî ji xaka sûriyê û gihandina wî parçeyî bi welatekî biyanî ve hate tewanbarkirin.

3-Şukrî Xalid Umer (1988) di 09.02.2006an de hate girtin û sezaya pênc sal zindan lê hate birîn. Ew bi endamtiya komeleyek siyasî, nihênî û qedexe (PYD), hewldana parçekirina beşekî ji xaka sûriyê û gihandina wî parçeyî bi welatekî biyanî ve hate tewanbarkirin û hewriha bi behaneya ku ew bi hin kiryar ku cengek navxweyî li sûriyê pêk bê hate tewanbarkirin. Ji ber wilo biryar bi karên giran û cefayî hetahetayê lê hate birîn, paşê biryara dawî bi 12 sal zindan lê hate birîn.

Herwiha heman dadgehê di 08.11.2009an şeş sal zindan li çar welatiyên kurd ên din, ku endamên partiya yekîtî ya demoqrat PYD ne, birî. Ew jî ev in:

1-Nasir Ehmed Mihemed (1987), xwendekarê amojgeha bijîşkî ye-Beşê Tîrêjan, sala duyem dixwîne. Ew di 06.08.2008an ji aliyê hêzên ewlekariya siyasî ve li Şamê hati bû girtin.
2-Raid Fewaz Elî di 19.07.2008an hati bû girtin.
3-Siûd Şêxmûs Ibrahîm di 25.01.2009an de hati bû girtin.
4-Ebdil Rehman Mistefa Mihemed (1974) di 26.11.2008an de hati bû girtin.

Ji bo sê siyasetvanên kurd sê sal zindan

Di roja 15.11.2009an de dadgeha tewankariyan li Şamê biryara sê sal sezaya zindanê da sê endamên serkirdayetiya Partiya Azadî ya Kurd li Sûriyê. Birzên Mistefa Cumaa Bekir, Mihemed Seîd Hisên El Umer û Sedûn Mehmûd Şêxo bi qelskirina hestên netewî (yên erebîtiyê) û arandin û gurkirina kînên zavî û tayifî hatin tewanbarkirin, herwiha dadgehê ew ji mafên wan ên şarewerî jî bêpar kir.

Siyasetvanê kurd Mihemed Salih Xelîl hate girtin

Rêxistina kurdî ji bo parastina mafên mirovan û azadiyên giştî li sûriyê DAD ragihand ku di roja 11.11.2009an de komek ji hêzên ewlekariya leşkerî li bajarê Efrînê siyasetvanê

kurd û endamê nivîsgeha ramyarî ya Partiya demoqrat a kurd li sûriyê El Partî birêz Mihemed Salih Xelîl girt. Tê zanîn ku birêz Mihemed Salih Xelîl di sala 1953an ji dayik bûye, xwedî malbat e û 4 zarokên wî hene. Hate ragihandin ku ew ji ber çalakiyên xwe yên siyasî hatiye girtin.

Xwendekarê kurd Rojhat Mihemed Mihemed hate girtin
Komîteyên parastina azadiyên gîştî û mafên mirovan li sûriyê û hinek çavkaniyên mafnas li sûriyê ragihandin ku komek ji hêzên ewlekarî li bajarê Hesiçayê di roja 22.10.2009an de xwendekarê kurd Rojhat Mihemed Mihemed girt û ew ji bo şaxê ewlekariya siyasî yê bajarê Hesiçayê guhastin. Heya aniha çarenivîsa wî ne diyar e.

Ewlekariya siyasî li Helebê du xwendekarên kurd digire
Hate ragihandin ku bargeha ewlekariya siyasî ya bajarê Kobanî di roja 30.10.2009an herdû xwendekarên kurd Enter Şewket (1990, beşê huner û şêwekariyê li bajarê Helebê, sala yekem dixwîne) û Mistefa Nesan (Li zanîngeha Beyrûtê dixwîne) vexwestin û paşê ji bo şaxê ewlekariya siyasî li bajarê Helebê hatin guhastin. Heya aniha çarenivîsa wan ne diyar e.

Asayîşên elman endamê MAF Enewr Deqorî girtin
Rêxistina mafên mirovan li sûriyê MAF ragihand ku asayîşên elman endamê wê yê rojnamevan Enwer Deqorî girtin. Asayîşên elman ew li gorî daxwaza navenda penberiyê ya Frensayê ew girtin. Ji ber ku Enwer Deqorî xwe wek penaber li Frensayê di sala 2008an de da bû û li wê derê salek zindan lê hati bû birîn û derbaskirin xaka Frensayê hetahetayê lê hati bû qedexekirin.

Paşê ew ji bo elmanyayê hati bû vgerandin ji ber ku ewî beriya Frensayê li Elmanyayê jî xwe wek penaber da bû. Di roja 12.11.2009an kargêriya biyaniyan li bajarên Aachen û Halle-Saale ji asayişan xwestin ku wî bigirin û bişînin Frensayê, tevî ku parêzerê wî biryar ji dadgeha bilind a herêma Sachsen-Anhalt anî bû, ku dê carek din li rewşa Enwer Deqorî bête nihêrtin. Tê zanîn ku biryar hati bû standin da ew di roja 16.11.2009an bo Frensayê bête vegerandin, lê mixabin bi awayekî lez û j nişka ve di roja 12.11.2009an de hate vegerandin.

Welatiyekî kurd wendayî ye
Rêxistina mafên mirovan li sûriyê MAF ragihand ku birêz Neşet Mistefa Henan ku 45 salî ye ji roja 27.10.2009an ve ji aliyê komek hêzên ewlekariya siyasî ya bajarê Helebê hati bû girtin û paşê ji bo şaxê ewlekariya siyasî li bajarê Şamê hati bû guhastin, heya aniha wendayî ye. Hate ragihandin ku birêz Neşet Henan gelek caran pêrgî vepirsînên hêzên ewlekariyê bûye, nexasim ji Newroza 2008an ve. Heya aniha çarenivîsa wî ne diyar e.

Xwendekarekî kurd ji bajarê zanîngeh û zanîngeha Şamê hate avêtin
Rêxistina kurdî ji bo parastina mafên mirovan û azadiyên gîştî li sûriyê DAD ragihand ku cîgirê zanîngeha Şamê û berpirsiyarê karûbarên kargêriyê û xwendekaran di 05.10.2009an de biryara 515 di der heqê xwendekarê kurd Bafil Elî de derxist.

Biryar dibêje ku dê Bafil Elî (Beşê Wêjeya Erebî li Zanîngeha Şamê dixwîne) salekê ji zanîngehê bête avêtin û herwiha bi yekcarî ji bajarê zanîngehê li Şamê bête avêtin. Ev biryar ji 16.03.2009an ve dest pê kiriye.

Tê gotin ku ev biryar di der heqê Bafil Elî de hatiye standin ji ber çalakiyên wî di warê ragihandin û rojnamevaniyê de. Tê zanîn ku hêzên ewlekariya leşkerî li Qamişlo ew di 05.04.2009an girti bû û paşê ji bo şaxê ewlekariya siyasî li Şamê (Şaxê Felestînê) hati bû guhastin û di roja 24.05.2009an de serbest hati bû berdan.

Hinek çavkanî dibêjin ku siyasetvanê kurd Pîr Ristem hatiye girtin
Rêxistina mafên mirovan li sûriyê MAF ragihand ku hinek nûçe bi dest xisitne dibêjin ku siyasetvan û nivîskarê kurd Pîr Ristem (Ehmed Mistefa, 1963) hatiye girtin. Nûçe dibêjin ku hêzên ewlekariya sûriyê yên li Beyrûtê ew girtine. Di dema dawî de ew di navbera Hewlêr û Beyrûtê de diçû û dihat û ji nişka ve têkilî hew pê re bû. Cara dawî ku têkilî pê re hate girêdan di roja 24,10.2009an de bû.

Tê zanîn ku birêz Pîr Ristem endamê rêxistina kurdî ji bo parastina mafên mirovan û azadiyên giştî li sûriyê DAD, endamê encûmena niştîmanî ya ragihandina Şamê û namzedê komîteya navendî ya partiya demoqrat a kurd li sûriyê El Partî ye. Herwiha 14 pirtûkên wî yên têvel hene wek roman, çîrok û lêkolînên bi zimanê erebî û kurdî.

Bêrîvan Farûq Mihemed û Selîm Ezîz hatin girtin
Rêxistina kurdî ji bo parastina mafên mirovan û azadiyên giştî li sûriyê DAD ragihand ku hêzên ewlekariya sûriyê di 17.11.2009an de Bêrîvan Farûq Mihemed û Selîm Ezîz vexwestin û paşê ew girtin.

Birêz Bêrîvan Farûq Mihemed û Selîm Ezîz di roja 18.10.2009an ji başûrê kurdistanê vedigeriyan û li balefirgeha Şamê hatin rawestandin û pasportên wan ji wan hatin standin. Paşê ew ji bo kargêriya mişextî û pasportan hatin guhastin û dawiyê ji hêla hêzên ewlekariyê ve hatin girtin. Heya aniha çarenivîsa wan ne diyar e.